YEKMAL

Komeleya Yekitiya Malbatên ji Kurdistanê li Berlînê

Verein der Eltern aus Kurdistan in Berlin e.V

Waldemar Strasse 57, 10997
Phone: +493061625848
E-mail: info@yekmal.de
Web: https://yekmal.de

Berlin, 29.08.2018

Malbata me ya bi rûmet,

Ev serdem ji bo me hemuyan serdemeke gelek taybet e. Ji ber ku zaroka/ê we yekem gavên xwe diavêjin perwerdehiyeke berfireh. Em hêvî dikin ev serdem berî her tiştê ji bo zarokan, paşî ji bo we û hemû civaka me kêrhatî û serkeftî derbas bibe.

Di Kita Pîya'yê de we zarokên xwe dan destê xebatkar û kesên pispor, ku hem karê xwe hem jî berbirsiyariyên xwe baş dizanin. Di Kita Pîya'yê de, berî her tiştê zarokên we dê perwerdehiyeke kêrhatî û bi qalîte bigirin; ev perwerdehî dê bi duzimanî, bi gotineke din, bi kurdî û almanî pêk were; zarokên we dê hem ji aliyê mejiyî hem jî fîzîkî li gorî bernameyek pêş de herin; xwebaweriya wan û hişyariya wan a nasnameya civakî û çandî zêde bibe.

Pêşveçûna duzimanî yek ji armancên sereke ya Kita Pîya'yê ye. Em ê ji serê salê heta dawiya salê bi sedan çalakî, xebat, lîstik û çîrokan her tiştê bikin ku zarokên we duzimanî mezin bibin. Bi rêbeza Zimanek Kesek, zarokên ku qet kurdî an jî almanî nezanin jî ew ê baş hîn bibin. Bikaranîna zimanê nû wek lîstikekê û di nav bernameyeke de tê bikaranîn ku zarok hem li zimanê(n) xwe yê nû hem jî li hêlîna xwe, mamosteyên xwe, hevalên xwe û derdora xwe zû û bi rihetî germ be.

Di van çend hefteyên derbasbûyî de, zarokên we hevalên xwe, hêlîna xwe, mamosteyên xwe nas kirin û guhê xwe dan zimanên ku di hêlînê de tên axaftin. Ji meha nû û pê ve em dest bi serdemeke aktîftir dikin.

Em careke din dibêjin, serdema nû ji bo zarokên we, ji bo we, ji bo me û ji be hemû civaka me pîroz be.

Bi slav û rêz